Ji bo Te
ku li Perwerdeya komunal a salmezinan ji bo maciran berdewam dike

Azmûna dawîn a millî (sfi)

Slav!

Tu wê nuha bikevî azmûna dawîn a millî, ya perwerdeya komunal a salmezinan, a dersa Svenska för invandrare (swêdî bo maciran) (sfi). Mebest ji azmûnan ev e, ku mamoste bikaribe bizane, tu çend baş karibûyî xwe bigehînî pîvanên (krîterên) notan yên pîlana kursê. Her wisa, azmûn dikarin alîkariya mamosteyan bikin, da ku mamoste li nirxandina zanyariyên şagirdan, xwedî pîvaneke wekhev bin.

Pîlana kursa perwerdeya komunal a salmezinan, ya Svenska för invandrare, hem ji bo nirxandinê û hem jî ji bo amadekirina pirsan, bingeha azmûna zanyariyan e. Pir girîng e, ji bo her şagirdekî derfet were dayin, ku çend bikaribe zanyariyên xwe nîşan bide. Mirov nikare bi azmûnekê hemû zanyariya şagirdî bipîve. Encama azmûna te ya netewî, beşek e giştî ya nirxandina li vê kursê ye, ku ji bo karneya te dibe bingeh. Lê belê, derbareyê zanyariyên te, mamosteyê te wê nirxandinekê bike.

Azmûnên sfi çawa dibin?

Naveroka giştî ya li pirsên azmûnê, ji şiyana xwandinê û têgeha ji nivîsan pêkhatiye; peyivtin, têgeha ji peyivtinê û nivîsîna derbareyê babetên cihêreng, ên ku pêwendî bi jiyana rojane heye, kar û jiyana civakî..

Azmûn, li navbera çar ta pênc saetan dibe.

Azmûn ji beşên cihê pêk tê:

- Kesên ku ji têgeha xwandinê azmûn dibin, li du kitêban hatine parkirin. Pirs hem li ser nivîsên kurt û hem jî li ser nivîsên hinekî dirêj hatine avakirin..
- Beşê ku têgeha bihîstinê dipîve, azmûn dike, ji kitêbeka bo kursa C û D, û her wisa ji du kitêbên kursa B pêk hatiye. Pirs li ser bingehê naveroka hevpeyvîn, axiftin û nûçeyên hatine tomarkirin hatine çêkirin.
- Beşê ku jêhatîbûna nivîsînê azmûn dike, derbareyê jêhatîbûna nivîsnivîsîneke ya li kursa B û C, û her wisa du nivîsnivîsînên li kursa D ne.
- Beşê ku jêhatîbûna peyivtinê azmûn dike, derbareyê pirseke tenê ya li kursa B, û her wisa pirseke derbareyê paruppgift (pirsên cot) ya li kursên C û D ye.

Mamosteyê te, gava tu azmûnê dikî, agehî derbareyê ku azamûn çawa dibe û derbareyê awayê nirxandina azmûnê, agehiyan dide te. Notên azmûnê li gor dereceya notan ya Pejiranî [Godkänt] (G) û Ne pejirandî [Icke godkänt] (IG) têne dayîn.

Şagird, dikarin paşê azmûna xwe û azmûn çawa hatiye nirxandin, bibînin. Lê belê gava ev azmûn pêşberî şagirdan dibe, girîng e ku mamoste nehêlin pirsên azmûnê li nav şagirdan fireh belav bibe.

Berpirsiyar ji azmûnê

Skolverket, ji hemû azmûnên millî berpirsiyar e. Ev azmûn, ji hêla Institutionen för ämnesdidaktik vid Stockholms universitet'ê ve, ku li gel Skolverket'ê dixebite, tê amadekirin û hilbijartin. Van pirsên li azmûnan, li gelek xwendegehên cihê yên li welat, hatine meşqkirin û ceribandin. Xebatkarên li perwerdeyê, mamoste û lêkolîner, di amadekirina van pirsên azmûnê de, pêşniyarên xwe kirine û dîtinên xwe gotine.

Me hevî heye, ku van azmûnên kursan, bi dilê te be û derfetê bide te, ku tu bikaribî zanyariyên xwe nîşan bidî.

Ew kesê li Skolverket'ê ku tu pê re bikevî pêwendiyê:

www.skolverket.se/kontakt